



## Pirsên ji dê û bavan (Elternbogen)

Keçik Kurik 

(Paşnavê zarokê)

(Navê zarokê)

(Rojbûn)

(Paşnav, Navê weliya/ê zarokê)

(Kuçe, hjm.)

( )

(Koda Posteyê )

(Cih)

(Telefon)

Dema çûna zaroka we ya baxçeyê zarokan (Kindergarten) Zaroka we pêşiya 3 saliya xwe qet çû zarokxanê (kreş) yan jî cihekî wisa?  Erê  Na

Zimanên di malbata we de pê tene axaftin\*:

 Tenê bi almanî Bi piranî bi almanî Bi piranî bi zimanên din Tenê bi zimanên din

Kîjan ziman?

 Bosnayî Kurdî Sirbî Îtalî Polonî Tirkî Kroatî Rusî Zimanekê din

\*Mebest zimanên rojane yên di nava malbatê de tene axaftin e, ne zanîna zimanan e.

nalzêde kêm  
caman  
pir/herdem

Zaroka we bêdeng e?

Zaroka we lal dibe?

Zaroka we dikare baş guhdarî bike?

Zaroka we pirs û daxwazan şaş fêhm dike?

Zaroka we gelek caran pirsan dike?

Dema tevlihev were axaftin, zaroka we ne baş fêhm dike?

Dema bi dengê nimiz were axaftin, zaroka we ne baş fêhm dike?

Erê Na

Zaroka we bi zimanê we yê hûn di malbatê de pê diaxivin normal diaxive?

Zaroka we diçe komel yan jî cihekî din yê mijûlbûna zarokan?

Zaroka we bi zarokên almanîxêf re jî dilîze?

Nexweşiyek yan jî pirsgerêkek e zaroka we ya bandorê li axaftinê jî dike heye?

Ku bersiv erê be, çi? \_\_\_\_\_

Zaroka we ji ber wê yekê terapiyê dibîne?

Zaroka we terapiya axaftin ango zimên dibîne?

Erê Na

Di nava malbatê de kesên (Dê û bav/Xwûşk û bira) xwedî van pirsgerêkan hene?

Pirsgerêka xwendin û nivîsandinê (kêmasiya xwendin û rastnivîsê)

Pirsgerêka axaftin ango zimên

(Cih, Dem)

(Şanênava weliya/ê zarokê)

## Agahdariya ji bo dê û bavan (Elterninformation)

### Di derbarê Lêkolîna Taybet ya Zimên ya Zarokan de (Kindersprachscreening in Hessen - KiSS)

Dê û bavên hêja,

Ziman kilîta herî girîng ya ji bo fêrbûnê ye. Bi pêşveçûna zimên gava sereke ya pêşeroja zaroka we dest pê dike. Ji wê yekê gelekî girîng e ku hê di demeke zû de hûn baldarî pêşveçûna zimên û tevgera têkiliyê ya zaroka xwe bin. Ev baldarî wê bibe sedem ku hûn li ser rewşa zaroka xwe ya heyî agahdar bin û bi vî awayî ger kêmasiyên zarokê di vî warî de bala we bikişîne, hûn dikarin bikevin di nava hewldayîna sererastkirina van aliyên zarokê. Ji wê yekê gelekî girîng e ku hûn hê di demeke zû de hay ji pêşveçûna zimên û tevgera têkiliyê ya zaroka xwe hebin û ger hûn pêwistiyê ango kêmasiya zarokê bibînin, bikevin di nava hewldana alîkarî ango pêşdebirina zaroka xwe de.

Her wiha gelekî girîng e ku hûn bizanibin ka pirsgirêka axaftinê ya zarokê heye. Pêwist e hebûna pirsgirêka axaftina zarokê hê zû were keşîkirin û di wê çarçoweyê de pêşiya destpêka dibistinê ya zarokê li rêyên tedawiyê were gerandin û bi vî awayî alîkarî ji bo zarokê were kirin.

Lêkolîna Taybet ya Zimên ya Zarokan ya Eyaleta Hessenê (KiSS) muameleyeke ji bo şopandin û çavlêgerandina rewşa zimên ango axaftinê ya zarokên di temenê 4 û 4,5 salî de ye. Ev Muamele niha li hemû baxçeyê zarokan (Kindergarten) yê Eyaleta Hessenê tê birêvebirin. Di vî warî de baxçeyê zarokan ya zaroka we jî delfetê dide çavlêgerandina li ser rewşa axaftinê ya zaroka we ya takekesî. Beşdarbûna vê lêkolînê azad e, ango ne mecbûrî ye.

Dê û bavên hêja, ku hûn van rûpelan dagirin, hûn dikarin ji bo pêşveçûna axaftin û ziman ya zaroka xwe bibin alîkar, ji ber tîkes wekî we zaroka we nas nake.

Ji kerema xwe vê daxwaznameyê û van pirsên ji bo dê û bavan şûnde bidin baxçeyê zarokan. Piştî we ev daxwazname paşde da baxçeyê zarokan, wê ev pêvajoyê pêk were:

- Di heftiyên pêş de wê mamosteyên zarokan yê pispor yê baxçeyê zarokan dor 20 deqîqeyan Lêkolîna Taybet ya Zimên ya Zarokan (Kindersprachscreening in Hessen - KiSS) pêk bînin.

- Mamosteya/ê pispor wê li baxçeyê zarokan kaxeza bi navê "Kitabogen" ya di derbarê rewşa axaftin ango zimên ya zaroka we de dagire.

- Wê bi agahdariyên di Lêkolîna Taybet ya Zimên ya Zarokan - Screening, kaxeza Agahdariya ji bo dê û bavan û "Kitabogen" (digel encaman) werin tomarkirin. Bi peywirdayîna Saziya Fermî ya Tendûristiyê (Gesundheitsamt) wê ev agahdariyên hatine tomarkirin ji bo lêkolînê ji Navenda Pêşgirî ya Zarokan ya Eyaleta Hessenê (Hessischen Kindervorsorgezentrum - Abteilung „Kindersprachscreening“) werin rêkirin û wê li wira bîn hûrbînkirin ango analîzkirin. Li ser daneyên nasnameyî jî wê tenê Saziya Fermî ya Tendûristiyê xwedî maf be. Saziya Fermî ya Tendûristiyê ya we jî wê we yan bi rêya nivîskî yan jî bi rêya mamosteyên zaroka we, we di derbarê encama rewşa axaftina zaroka we de agahdar bike. Hûn dikarin bêhtir agahdariyan di derbarê Navenda Pêşgirî ya Zarokan ya Eyaleta Hessenê ya ku li Frankfurtê ye, li ser malpera Wezareta ji bo Kar, Malbat û Tendûristiyê ya Eyaleta Hessenê bibînin: [www.hmafg.Hessen.de](http://www.hmafg.Hessen.de)

- Qalîteya KiSS'ê wê bi awayekî periyodîk ji hêla Navenda Pêşgirî ya Zarokan ya Eyaleta Hessenê ve were kontrolkirin. Lêkolînên li ser mijarê yê wê di heman demê de werin birêvebirin û encamên erênî yê werin bedestxistin wê ji bo encambidestxistineke baştir ya KiSS'ê werin bikaranîn. Ji bo lêkolînê wê naverok be yî agahdariya nasnameya takekesî werin bikaranîn.

- Saziya Fermî ya Tendûristiyê wê piştê agahdariyên KiSS'ê ji bo muayeneya ji bo çûyîna dibistanê (Schuleingangsuntersuchung) ya zaroka we bi kar bîne.

Dane wê li Navenda Pêşgirî ya Zarokan ya Eyaleta Hessenê salekî tomarkirî bimînin û piştî salekî wê agahdariyên nasnameyî jê werin deranîn ango anonîmkirin.

Bêguman ger hûn bi zaroka xwe tevî vê azmûnê jî nebin, elaqedarbûna bi zaroka we re wê li Kindergatinê wekî berê berdewam bike. Ji kerema xwe ji bo zaroka we bê kelem bikaribe dest bi dibistanê bike, hûn jî tevî bibin.

Zor Spas.

Saziya Fermî ya Tendûristiyê (Gesundheitsamt) ya we

Navnîşan:  
Hessisches Kindervorsorgezentrum (HKVZ)  
am Klinikum der Goethe-Universität Frankfurt am Main  
Telefon: (069) 6301-87800 Telefax: (069) 6301-87783  
Internet: [www.kindersprachscreening.de](http://www.kindersprachscreening.de)  
Email: [info@kisshessen.de](mailto:info@kisshessen.de)

Ji bo agahdariya we: Li ser şert û mercên parastina daneyên takekesî yê ji bo birêvebirina Lêkolîna Taybet ya Zimên ya Zarokan (Kindersprachscreening) bi Rayedariya Fermî ya Parastina Daneyan ya Eyaleta Hessenê re hatiye axaftin.



## Erêkirina daxwaznameyê (Einverständniserklärung)

Di derbarê Lêkolîna Taybet ya Zimên ya Zarokan de (Kindersprachscreening in Hessen - KiSS)

Ez dipejirînim ku keça min/kurê min

\_\_\_\_\_

\_\_\_\_\_

beşdarî Lêkolîna Taybet ya Zimên ya Zarokan (Kindersprachscreening - KiSS), ya wekî di agahdariya ji bo dê û bavan de hatiye nivîsandin bibe.

\_\_\_\_\_

\_\_\_\_\_

## Cih, Dem

**Navnîşana baxçeyê zarokan:**

**Nav û navnîşana dê û bavên:**

Encama teşhîsa zimên ya \_\_\_\_\_

Kontrola encama teşhîseka zimên

Dê û bavên hêja,

Ji bo çûyîn ango destpêkirina dibistanê û fêrbûneke serkeftî ya zarokan, pêwest e ku zarok di warê zanebûna zimên de di asta hemtemenên xwe de bin. Her wiha şertekî din jî zanebûna baş ya zarokan ya bi zimanê almanî ye. Ji bo vê yekê beşdarbûna azmûna asta zimên gava yekemîn ya ber bi vê rêyê ve ye. Zaroka we jî beşdarî azmûn ango kontrola asta zimên bû. Di azmûnê de gelek aliyên zimên ya zaroka bi rêya Lêkolîna Taybet ya Zimên ya Zarokan (Kindersprachscreening - KiSS) di ber çavan re hatin derbaskirin. Her wiha çav li pirsgirêka dengderxistinê ya muhtemel û axaftina herikbar (Wekî mînak; lalbûn) hate gerandin.

Di encamê de ev çavdêrî derketin holê:

- Ziman ango axaftin û dengê zaroka we di asta hemantemenên xwe de ye.
- Ziman ango axaftina zaroka we bi giştî di asta hemantemenên xwe de ye lê belê di van xalan de bi sînor e:
  - Fêmkirin
  - Bilêvkirin ango telafûzkirin
  - Xizîneya peyvan
  - Rêziman ango gramer
- Di fêmkirin ango têgihiştinê de hinek pirsgirêk hene.
- Di xezîneya peyvan de hinek pirsgirêk hene ango xezîneya peyvan kêm e.
- Di warê rêziman ango gramerê de hinek pirsgirêk hene.
- Di bilêvkirina peyvan de hinek pirsgirêk hene.
  - Bilêvkirina tîpa „r“  Bilêvkirina „k/g“
- Ji ber zaroka we heta niha hindikî bi zimanê almanî dizane, tenê hindikê kontrola KiSS'ê karî pê re were çêkirin.
- Gumana lalbûn an jî pirsgirêkeke din ya axaftina herikbar heye.
- Gumana pirsgirêka deng heye.
- Gumana çewtiyeka xebatê ya axaftina bîra (hafiza) demkurt heye.
- Gumana pirsgirêkeke dengnebihistinê heye.
- Zaroka we hêjî tam fêrî bilêvkirina tîpa „sch - ş“ an „s - z“ anjî ya herduyan nebûye.

### Tewsiye

- Bergirî (tedbîr) ne pêwîst in.
  - Piştgiriya we ya bi kêf ya bi riya sohbet axaftinên bi zaroka we re wê ji bo pêşveçûna zarokê ya di warê zimên de bibe alîkar.
  - Tewsiyeya beşdariya rêkûpêk ya zarokê ya kursa pêşvebirina zimên baxçeyê zarokan.
  - Kontrolkirineke piştî 6 mehan (li baxçeyê zarokan ango saziya zarok diçiyê) tê pêşniyarkirin.
  - Ji ber nekarîna tam ya bilêvkirina tîpên „sch - ş“ an „s - z“ paşkontroleke di dema 5' mîn rojbûna zaroka we de tê tewsiyekirin. Ev paşkontrol jî li baxçeyê zarokan ango saziya zaroka we diçiyê tê kirin.
  - Ez dixwazim bi we re bi axifim. Ji kerema xwe bi rêya telefonê têkiliyê bi min re daynin.
  - Tewsiyeya çûyîna cem doktorê zarokan tê kirin. Li cem doktorê zarokan wê biryara kontrolên din û terapiyeye zimên ya muhtemel were dayin.
  - Li gor agahdariya me, zaroka we niha li cem doktorê tedawiye dibîne. Ji kerema xwe vê nameyê bidin wir. Zor spas.
- Ger pirsên we hebin, emê bi kêfxweşî ji we re bibin alîkar. Ji ber vê yekê yan têkiliyê bi min re yan jî bi mamosteya baxçeyê zarokan ya ev kontrol pêk anî re daynin.

\_\_\_\_\_  
(Paşnav/Şanênava pispora axaftinê)